

Raporî Bîker-Hamlîn

**Sîyasetî Emrîka be binbest  
geyiştuwe ya Pirrojey "îraqî  
dîmokratî û fîdralî ? "**



Ibrahim A. Yasîn  
Zankwî lund-swîd

**Nawerokî bas**

Pêşekî

Pirrojey dewletî îraq

Dewletî îraq diway rûxanî rijêmî beis

Sîyasetî emrîka le îraq: Le tewjim û hêrşewe bo paşekişî

Raporî bîker-hamlîn

Derencam

Hendê bîruboçûn û "pêşniyar"

Perawêzekan

## Pêşekî

Maweyeke lêre û lewê, le astî cîyacîyay ekadîmî û sîyasî û dîplomasîda, be germî bas le kêşey îraq û sîyasetî emrîka lem peywesteda dekirê. Le rojanî diwayîşda em giftugoyane be astêkî tir geyîştûn be hoy rageyandinî raportî grupî cêymis bîker–Lî hamltin (ke herweha wek rapurtî giropî mitalakirdinî îraq nawdebirê), le berdewamî em wîtarenda wek rapurtî bîker–Hamltin nawdebirê.

Lem wîtarenda hewlê ewe nadem ke le tewawî raporteke bikollmewe, tenha ta ew cêgeyey ke bo tawtwêkirdinî pirsîyarekanî bas pêwîst debê amaje be raporteke dekirê. Bo nûsînî babetêkî ewiha le dîdêkî Kurdistanîyewe pêwîst dekat nek her sîyasetî emrîka le pirojey damezirandinewey dewletî îraq (we e 2û pirojeye weku beşêkî giring le ewey ke pêy debêjin piro. Jey rojhelatî nawerastî mezin) bas bikirê, bellku be heman şêwe û be heman giringî bas le ruwekey tirî diraw (wate sîyasete kurdîyekan le çîwarçêwey pirojey damezirandinewey dewletî îraq) bikirê. Be manayekî tir hewilldan bo tenha û tenha berpirskirdinî emrîka lew bardoxey îraq û Kurdistan û ew binibestey ke ew zilhêzey pêgeyîştuwe, nek her yarmetî nadat bo têgeyîştinî rastîyekan, bellku rêkixodzîneweye le berpirsî layenekanî tir lem bardoxe.



Leber firawanî babeteke û be leberçawgirtinî ewey ke witareke le rojname bilawdebîtewe, tenha hewilldedem ke çend pirsîyarêkî sinûrdar burûjênim: 1) çon lew binibeste degeyn ke sîyasetî emrîka le îraq û pirojey dewletî îraqî pêgeyiştuwe? 2) ta çi radeyek detwanîn bas le fakterî kurdî bikeyn lewey ke mesele peywendîdarekan, be taybet meseley çarenûsî başûrî Kurdistan, bem aqare geyiştûn? 3) ew elterinetîvane çîn ke detwanin rûdawekan berew aqarêkî tir biben?

Şêwey pîyadekirdinî em babete le rûy mîtodiyewe eweye ke bo têgeştinî em barudoxe û baskirdin le elterinetîvekan pêwîst dekat ke bas le rolî emrîka û serkirdayeti sîyasî başûrî Kurdistan bikeyn. Rolî layene erebîyekanî îraq û alloziyekanî îraqî erebî cêgey le naw kirrokî basda nabêtewe, leber hoyekî asan ewîş eweye ke em witare hewllêke bo baskirdin le riwangey Kurdistanî, be peywest legell sîyasetî emrîka, bo babeteke.

### **Pirrojey dewletî îraq**

Şardirawe nîye ke damezirandinî îraq, wek dewletêk le çiwarcêwey pirrosey be dewletbûn le rojhelaî nawerast le diway cengî yekemî cîhanî, ta radeyekî zor derhawêştey sîyasetî koloniyalî berîtanîyay mezin bû. Bezor likandinî beşêkî Kurdistan bem dewletewe, diwatirîş hewlî berdewam bo parastinî ew hallete be xwên û agir, heleyek û nadadperwerîyekî mêjûyî bû. Cige le eweş ew dewletî îraqe be komellê kêşey ciddiyewe hate naw sîsitemî rojhelaî nawerast û cîhanewe, her yekê lew kêşaneş le berdewamî dewletî îraqda nek her çareser nekiran bellku bigre be aqarî teşenebûn û bezehmetkewtinîşda çûn we emroş be çirî ameddeyîyan heye, em kîşane birîtibûn le: 1) kêşey şîye. 2) meseley kurd. 3) deselatî kemîney sunney ereb. 4) ew pêkhate komelayetîye teqilîdiyey ke danîştwanî ew wilatey pêkidehêna û hewilldan bo guncandinî ew komellgaye legell pîrensîp û damezrawekanî dewletî modêrn. 5) sinûrekanî îraq. 6) rehend û qulayîye kultûrî û sîyasî û stratîjîyekanî îraq lew nawçeda. (1)

Le layekî tirewe xebatî sallehay bizavî sîyasî û çekdaraney başûrî Kurdistan le çiwarcêwey bawerrêkda bû ke dekirê lew îraqe bezoremlêye û be hemû giriftakanîyewe dewletêkî dîmokratî, ke tîyayda mafekanî kurd misogerbûbin, berhembhêndirê. Le çirrikirdinewey mêjûy ew xebate û mahîyete fikrîyekeyda, detwanîn billêyin ke ew bawerbûne be berhembhênanî îraqêkî dîmokratî dijayetîyekî ciddî le xogirtuwe: Le layekewe bawerbûn be wey ke geyiştin bew amance şîyawe, û her eweş çaresere, belam le layekî tirewe, bawerrbûn bewey ke îraq dewletêkî bezoremlêye û bêçareyî waykirdiwe ke kurd ew bawerre sîyasîye hellbijêrê ke ewîş bedesthênanî îraqêkî dîmokratîye.

Be bawerrî min, diway ew hemû salane lew xebat û qenaete fikrîye û ew hemû hewlaneş diway kewtinî dîktayorî îraq be heman arrasteda, emro kurd berewrûy

halletêk bûnetewe ke dewêda pirs nabê ewebê ke aya hêz û tiwanay serbazî û abûrî û dîplomasî emrîka têrî berhemhênanî îraqêkî dîmokratî deka ya na, bellku debê carêkî tir ew pirse bêtewe gorrê ke aya esllen pirrojey dewletî îraq şîyawewe ya na, we eger şîyawewe çon?

Be boçûnî xom mahîyet û çîwarçêwey rapotekey bîker–Hamltin rêk base le şêwazî bebnecêgeyandinî pirrojey dewletî îraq, hellbete zêtir le dîdêkî emrîkiyewe.

Bem manayeş pirsîyareke zîyatir debê ewebê ke aya be berdewamî û bigre çirribûnewey ew giriftaney ke her le bînasazî dewletî îraqewe bûn û berdewamîyan hebewe, we le diway dîktatorîş be şêwekî xwênawî û xesttir xoyan derdebirrin, dekirê her pêdabgirê leser hêştinewey dewletî îraq ya elterinetîvî tir hen.

### **Dewletî îraq diway rûxanî rijêmî beis**

Ber le her şitêk dekirê ewe billêyin ke emrîka ber le hatinî hêzekanî bo îraq bîrî lewe nekirdbuwewe ke berewrûy ew radeye le berhellistî û karî tîrorîstane debêtewe ke tiwana û wizeyekî zortir bixwazê lewey tenha bo xistinî rijêmî bexda. Leweş giringtir her zû bo emrîka aşkira bû ke tenha karî serbazî têrî ewe nakat ke serkewtinî sîyasî û dîplomasî le meseley îraqda bedestbhênê nek her serbazî. Bo eweş kare here qurseke, le rûy sîyasîyewe, meseley damezirandinewey dewletî îraq bû. Be her hall, bo em mebeste, çend ezmûnêk û sabîqey fikirî hebûn ke emrîka pirrojey damezirandinewey dewletî raq leser bîna kird ke be bawerrî min giringtirînî ew ezmûn û sabîqe fikrîyane ewane bûn. 1) leyekçuwandinî halletî îraq be ezmûnî japon û ellmanîyay diway cengî duwemî cîhatî. 2) bîna kirdinewey ser leniwêy dewletî îraq le rêgey "kopîykirinî" pirrojey berîtanîya bû hî damezirandinî îraq le sallî 1920. 3) hisêbnekirdinêkî ûrd bo ew kêşaney ke legell dameziranî îraq bûn be binema û diwatirîş xesletî ew dewletîyan pêkhêna le berdewamîdaye.

Ewey ke peywendî be xallî yekemewe heye (wate lêkiçwandinî îraq legell hendê ezmûnî tir( ewe dekirê be asanî billên ke xallî lêwederçûnî emrîka lem ruwewe çewit bû. Be bawerry min debê xallî leyekçwandin le nêwan yogslavîyay pêşû, wek pirrojeyekî ser nekewtûy neteweyî sirbekan, bikiraye ta leyekçwandin le gell ezmûnekanî japon û ellmanîya. Le rastîda emrro diway sê sall û nîw le karî berdewam bo weberhemhênanewey dewletî îraq, jimarey ew xawen ra û deselatdare emrîkiyaney ke bawerrîyan be lêkiçwandî îraq û yogslavîya heye (lewane pîter galbêrt, wek kone dîplomat û xawenirra lem bareyewe), le zêde bûn daye. Êstaş ew boçûne kepêştir ray hendêk le rûnabîr û kone dîplomat bû, ke îraqîş wek yogslavîya kotayî dêt, le mawey diwayîda be aşkira xirawete naw dar û destey deselat le emrîka.



Lem bareyewe, cige le hendê pêşnîyar le layen hendê kesayetî naw îdare û kongirês, donald ramisfêld, çend rojêk ber le helbjardine here diwayîyekanî kongirês (le mangî rabirdû) wate ber le destkêşanewey, raportêkî dawê be corc buşe we amajeyekî giringî lem bareyewe tîyaye. Le raportekeyda ramisfêld komellê pêşnîyarî xistoterrû we le dû pêşnîyarî here diwayî raporteke bîrokey dabeşkirdinî îraq bo sê herêm û morkirdinî peymanêk le corî peymanî "dayiton ", ke kotayî emelî be dewlletî yogslavîya hêna, xistoterrû. (2)

Dîyare eweş şardirawe nîye ke emrîka xoy endazîyarî serekî peymanî dayiton bû, her ew emrîkayey ke (leser zarî her em cêymis bîkere ke le kotayî heştakan û seretay newedekan wezîrî derewey emrîka bû) zwutir rayigeyandbû ke ewan be hemû şêweyek dijî dabeşkirdinî yogslavîyan, lêreda giringe eweş billêyin ke seretay hewilldan bo serleniwê damezirandinewey dewlletî îraq we le berdewamî pirosey sîyasî ew serleniwê damezirandineweyeda serkirdayetî sîyasî le başûrî Kurdistan neyitwanî be raşkawî be emrîkîyekan we be komellgay nêwnetewey billê ke lêkiçwandinî îraq legell japon û ellmanîya helleyekî gewreye û le akamîşda îraqîyekan û emrîkaş bacêkî zorî ew çewtîye deden. Ewey peywendî be xallî duwemewe heye (wate serleniwê bînasazî îraq leser binemakanî pirojey berîtanî) helleyekî mêjûyî tir bû ke binemakey kopîkirdinî taqîkirdineweyek bû ke xoy helleyek û narrewîayîyekî mêjûyî bû (be taybet beramber be kurd) ke be radeyekî serekî berhemî sîyasetî kolonîyalaney berîtanîyay mezin bû. Lem bareyewe debê be raşkawî billêm ke nûserî em wutare le dû nameda bo serkirdayetî partî û yekêtî, ke

her rojêk diway rûxanî hukmî diktator nardirabûn boyan, giringîyekî taybetî dabû be metirsî le dûbarekirdinewey nemuzec û pirojey berîtanî le îraqî diway sedam. Le namey yekemda rêk ewe hatuwe ke layenî kurdî debê her zû pirsîyarêkî ciddî berew rûy emrîkîyekan bikatewe û her ew serkirdayetîye xoşî bîrêk lew pirsîyare bikatewe, pirsîyarekeş bem şêweye bû: Aya ke pirrojey berîtanî le sazdanî dewletî îraq le mawey 83sall (wate le 1920-2003) serkewtû nebû, aya ewe çi şitêke wa dekat ke heman em pirrojîye leser destî emrîkîyekan ser bikewî? (3)

Ewey dexwazim lêreda cexitî leser bikem eweye ke ewe nek her emrîka bû ke bawerî wabû ke be her hall pirroje berîtanîya "be bergêkî emrîkîyewe "detwanê serkewtû bê, bellku serkirdayetî sîyasî başûrî Kurdistanîş lew bawerreda bû ke berhemhênanî îraqêkî dîmokratî û fîdirallî şîyawew "leser binemay pirojey berîtanîyeke. "nek her ewe, bellku seranî kurd lew beşey Kurdistan be şanazîyewe, lêre û lewê, basîyan lewe dekird ke kurd be ezmûnekeyanewe (1991-2003) detwanin pêşeng û nimûne bin lem pirroseweda. Nek her ewe bellku ber leweş ke esllen îraqêkî fîdirallî û niwê hatbête arawe mîdîyay resmî, be hemû şêwekanîyewe, her zû kewte naw pirroseweykî xestî razandinewey îraqî pîrr le tengeje û mîlîlanêy xwênawî le rêgey wesfkirdinî be îraqî fîdirallî û niwê. \*\*: Ew îraqey nek her beramber bi emrîka bellku legell xudî xoşîda le mîlîlanêyêkî xwênawî daye. Em razandineweye nek her gomanî şîyawnebûnî pirrojey dewletî îraqî lay hernebê beşêkî baş le xellkî kurd rewandotewe, bellku bigre waşî kirdiwe ke îtir îraqî niwê û fîdirallî le tesewirî xelkda berhemhatuwe û pirrojey be zoremlêy berîtanîş bem pêye buwe be pirrojey yekêti arezûmendane û îraqî dîmokratî.

Ewey peywendî be xallî sêhemewe heye (wate ew kêşaney bûne binema û xesletî dewletî îraq), detwanim billêm ke ew kêşane, be taybetî ew xalaney ke peywendîyan be nasname û deselatî sîyasîyewe hebuwe û heye, le qonaxî diway serbexoyî îraq (le julay 1958), be taybetî le mawey salanî hukmirranî beis û sedamda, ew kêşane zîyatir çirritir û qûlltir bûnewe. Debê le heman katda eweş billêyin ke rijêm hewlî ciddî şardinewe û bêdengkirdinî ew kêşaney da le rêgay mîkanîzmî tirs û toqandin û zorbohênan, belam katêk ke qelay tirs rûxa ew kate derkewt ke girifte konekan nek her çareser nekirabûn, bellku ew kêşane be taybetî le rehendi şîye û sunney erebewe be şêweyekî xwênawî xoy derbirrî. Eweşî ke kêşekanî yekcar qulltir kirdewe ew rastîye bû ke le rehende îqlîmî û cîhanîyekanîyanewe hendê lew kêşane teşenebûnêkî tazeyan bexowe bînî we bem core îraq bû be meydanî hendêk mîlîlanêy taze ke le seretay dameziranî îraqewe nebûn.

Her lew çîwarçêweyîyeda, be bawerî min, nakirê her wa be asanî bigotirê ke ew destûre hemîşeyîyey ke berhemhatuwe, ke diwacar lerrêgey tewjmêkî pirropagendey sîyasîyewe wa kira ke zorbey xellkî Kurdistan dengî bo bida, be rêgey zorbohênanî emrîka bû we kurd çarey tirî nebû. Be manayekî tir em destûre û ew qonaxey ke emro barî sîyasî başûrî Kurdistanî pêgeyîştuwe nakirê nellêyin berhemî ew qenaete

nîye ke le çiwarcêweyekî sîyasî-fikirîda nawî denê "otonomîzm". Diwacar xebatîş bo wedesthênanî otonomî (ke diwafir bû be fîdralî) û dîmokirasî bo îraq be hezaran we bigre sedan hezar qurbanî lêkewtewe. Dekirê lêreda ew pirsîyareş bikeyn: Aya ger tenha, kem ya zor, sîyasetî emrîka berpîrs bibîrê lew halletî binibestey ke pîrrosey be îraqîkirdinî başûrî Kurdistan û pîrrosey sîyasî le îraqî pêgeyîştuwe, ey genaet û sîyasete kurdîyekan û ew hemû karey ew layene bo curkirdinî pîrrojey dewlletî serleniwêy îraq kirdûyane le kiwêy hawkêşe û berpîrsîyarîyêti dewestê? Pîrse nîgeranamîz û hestîyarekanî barî sîyasî başûrî Kurdistan çirritir debînewe wextêk dezanîn ke le destûrî hemîşeyîda kurd hîç zemanetêk û hêlî xo parastinî sîyasî-Dîplumasî (weku mafî çarey xonûsîn be rêgey rîfirandumewe ya zemanetî nêwdewlletî ya piştîgîrîyekî bê sê û dûy zilhêzêkî we emrîka) bo halletî paşekîşê û binibest bedest nehênawe, bo ewey le halletî ewihada û xopêwebgirêtewe ya piştî pêbibestê. Le rastîda mesele binerretî û here giringekanîş (weku sinûr û kêşey Kerkuk) diwaxirawin, her wek çon li beyanî 11 marsî 1970da kira. Rêk ewe yekê lew nimûnaneyê ke pêmandellên fîdirallîyey emrro zortir le otonomîyeyê sallî 1970deçê ta şitêkî tir.

### **Sîyasetî emrîka le îraq: Le tewjîm û hêrşewe bo paşekîşê**

Be pêdaçûneweyêkî be pele be pêşiweçûnekanî peywendîdar bi meseley îraq û sîyasetî emrîka lem peywesteda le mawey rabirdûda, têbînî dekirê ke emrîka le halletî paşekîşê daye, emeş bo her nebê hendêk le şarezayan şitêkî kitupîr nebû, belku çawerrankirawîş bû. (4) lem bareyewe serkewtinî dîmokratikan le hellbijardinekanî kongirês (be her dû beşekanîyewe) merc nîye tenha karîgerîyekî nêgetîwaney hebê bo sîyasetî boş û komarîyekan le merr îraq, bellku bigre em pêşiweçûne detwanê derfetêkîş bê bo emrîka bo pêdaçûnewe. Be manayekî tir, em rûdawe dergey bo hendê Gorankarî le sîyasetî emrîka le îraq xiste ser pişt. Le rastîda heta beşêk le komarîyekan ke xwazîyarî Gorankarî bûn lem sîyaseteda demêk bû çawerrwanî derfetêk bûn bo encamdanî gorrankarî. Manay ewe nîye ke dîmokratikan, diway serkewtinîyan le hellbijardinekan, le teskbînîyekî hîzbîyewe û bo tollesendînewe le komarîyekan amadebin her core gorrankarîyek biken le sîyasetî emrîkada beramber be îraq, be bê giwêdane ew rastîyey ke kêşey îraq (be taybetî le rûy hendêk le rehendekanî ew kêşeyewe ke rastewxo asayîşî neteweyî emrîka peywendîdar deken) bote kêşey hemû emrîka weku netewe/ dewllet. Le rastîda nûserî em wîtare le çawpêketinêkî legell rojnamey (Kurdistanî niwê) da le kotay 2003û seretay sallî 2004ewey cexitkirdotewe ke eger emrîka derfetêkî hebê bo serkewtin le îraq ewa bêguman be rêgey beneteweyîkirdinî (ya beneteweyî bînînî) kêşeke debê, wate dûrgirtinî şerr le îraq û sîyasetî emrîka lem wilateda le halletî behîzbîkirdin. (5) her lem arasteyeda raportekey bîker-hamlîtin be raşkawî daway

ewe dekat ke meseley îraq le meseleyekî hîzbî derkirê we bibê be meseley hemû layenekan. (6) rêk lem xallewe, cêgey serinc û giringîye ke hellbijardinekan we derçûnî raportî bîker-hamlîn le rûy zemenîyewe zor le yektir nizîkin, bellku bigre le qonaxêka be çîrî têkelawî yektirîş debîn.

Pirrsîyarêkî giring lem peywesteda eweye: Aya ew elterinetîvaney kamanen ke le berdem emrîkan bo derçûn le binibest. Bo welamî em pîrsîyareş tenha gerranewe bo raportî bîker-hamlîn bes nîye bellku koy ew bîru boçûnaney ke derbirrawin be dirêjayî kat, her le diway kewtinî rijêmî îraq ta emiro.

Wek dezanîrê maweyeke zor kes û layen lêkollînewe û giftugu le ser jimareyek lew elterinetîvane deken we heta dêt em base qulltir û firawantir debêt. Le rastîda detwanîn koy em baswaxwasane le çend wişeyekî kemda kobikeynewe: Emrîka le meseley îraq û kêşey peywendîdarekanda be bê elterinetîvêkî bê kemukurrî mawetewe, be manayekî tir her elterinetîvêk ke bas dekirê hellbijardinî lewey tir qurstire. Bem manaye hîç elterinetîvêk natwanê be şêweyekî binerretîyane be serkewtinî tewaw (100%) bo emrîka le qelem bidirê. Lem halletda serkewtin û şkist herdûkîyan rijeyîn!

Be her hall ew elterinetîvaney ke ta êsta baskirawin be giştî emanen: 1) zêdekirdinî jimarey hêzekanî emrîka le îraq. 2) kişanewey be tewawetî emrîka lew wilate. 3) ser le niwê rêkixistewey hêzekan be peywendî legell pîrosey "beyiraqîkirdin "(9) we bem pêyeş kişandinewey beşêk le hêzekan. 4) parçeparçekirdinî îraq bo sê beş.

Dîyare elterinetîvî yekem, le baştirîn halletda, şîyaw bû we karîgerîşî debû eger le seretay pîrosey azadkirdin/ dagîrkirdinda reçawbikiraye newek diway ew hemû maweye. (7) cigelemeş emro zêdekirdinî jimarey hêzekanî emrîka le îraq asan nîye ewe eger esllen ferahemîş bibêt: Diway xesaretêkî zorî gîyanî ke le hêzekanî emrîka lew wilate kewtuwe û berzibûnewey dengî narrezayîyetî le emrîka beramber be cengî îraq û misogerinebûnî piştgîrî, be taybetî piştgîrî darayî, bo hengawêkî lem core le layen kongirêsî emrîkiyewe û zêdebûnî têçû (mesirufat) î manewey hêzekan le îraq (êsta mangane nizîkey 8milîyar dolar) û bezehmetkewtinî kokirdinewey jimareyekî pêwîst le serbazanî yedeg (îhtîyat), asan nîye, ewe eger esllen her bişkirê. Cige lemeş, core bawerrêkîş heye ke zêdekirdinî ew hêzane be jimarey 10ya 20hezar natwanê cîyawazîyekî binerretî stratîjî dirust bikat. Bem manaye zêdekirdinî bem jimare keme em elterinetîve nagayênête ew astey ke le rûy stratîjîyewe hawsengî hêz be şêweyekî binerretî bigorê. Cige lewe, debê eweş lebîr nekeyn ke dîwekey tirî kêşeke eweye ke pîrojey damezirandinewey dewlletî îraq be şêweyekî ciddî gîrî xwarduwe. Bo çareserkirdinî ew kêşeyeş, be her dû dîwîda (meseley asayîş û pîrosey sîyasî), bîrkirdineweyekî taze pêwîste ke bitwanê sinûrî bîrkirdinewey kilasîkî (piştbestin tenha be hêzî serbazî bo çareserkirdinî kêşekan we pîrojey îraqî yekbû) bibezênê û bem şêweyeş hendê elterinetîv û paradîmî niwê le bîrkirdinewey bihênête gorrê. Dîyare lem songeyeşewe giringe her zû ewe cixt bikirêtewe ke her hengawêkî



sîyasî, tenha be mebestî besîyasîkirdin û be dîplomasîkirdinî kêşekan, natwanê bibête zemanetî serkewtinî elterinetîvêkî lem core. Be manayekî tir her hengawêk lem bareyewe eger kok nebêt legell stratêjî emrîka (be mana here firawanekey le nawçew le cîhan) ewa hengawêke detwanê zîyanbexş bêt bo em stratêjîye ta sûdbexş.

Dîyare bo zîyatir be sîyasîkirdin û be dîplomasîkirinî kêşey îraq, ya rasttir billêyin dozînewey çareserîyek bo em kêşeye, le raportekey (bîker–Hamltin) da wa pêşnîyar dekirê kewa bo kemikirdinewey fişar Leser emrîka û sinûrdanan bo tîror le îraq debê destbikirê be giftugo legell êran û surîya. (8) be her hall, be bawerrî min pêşnîyarêkî lem core, heta eger nekewête biwarî piraktîkîşewe, be radey yekem tefekirdinî xokuştine ke le rûmet û mitmaney nêwneteweyî û sîyasete here berfirawanekanî emrîka le cîhan we be taybetî le rojhelatî nawerrast dekrêt. Le astî piraktîkîşda destpêkirdinî dîyalog legell ew dû wilate, her nebê be şeweyekî narrastewxo, rewayî bexşîne be sîyasetî piştgîrîkirdinî tîror û xerabkarîye ke ew dû wilate le nawçeda pîyadey deken. Be manayekî tir, dîyalogêkî lem core destî têror le lubnan û cêgey tir we ordugay dij be her pêşiweçûnêkî aştiyane, be taybetî le kêşey îsirayil û felestînda, behêz dekat. Herweha hengawêkî lem core debête hoy ledestdanî derfetî bererrûbûnewe le faylî "wizey etomî "êran, ew fayley ke maweyeke cîhanî rojawa (be taybetî emrîka) î bexoe xerîkkirdiwe û cêgeyekî taybetîşî heye le stratîjî here berfirawanî emrîka le cîhanî emrroda. Be boçûnî min em pêşnîyarey bîker-hamltin, ke dîyare zwutir senatorê dîmokrat (hîlerî kilîntin) îş kirdûyefî, amajeyeke ke le riwangeyekî kurtxayenewe hîç sûdêkî ewtoy nabêt we le riwangeyekî dirêjixayenewe detwanê zorîş zîyanbexş bêt bo emrîka: Dîyalog legell ew dû wilateda paşekîşeyekî here ciddî debêt. Pirsîyar lêreda eweye, aya dekirê emrîka paşekîşeyek û binibestêk be paşekîşeyekî ciddîtir çareser bikat. Welamî em pirsîyare le rûda û pêşiweçûnekanî dahatûda derdekewê.

Dîyare elterinetîvî duwem (kişanewey be tewawetî le îraq), be taybetî eger be pele bikirê we tîyayda hendê hîsabatî kurtxayen leberçaw bigîrê, detwanê be karesat tewaw bibê bo emrîka. Em wilate wek zilhêzêk, ke maweyeke lew baweredaye û xebatîş bo ewe dekat ke le cîhan law nawçeda endazîyarî Gorankarîye bineretîyekan bêt, dûr nîye be hengawî kişanewey be pele û be tewawetî destpêşxerî û "baladestî "xoy le merr Gorankarîyekan, nek her le îraq bellku le rojhelatî nawerrast û cîhanîş, le dest bidat. Nek her ewe bellku rewî gorrankarî û rûdawekanî nawçe, beher hall le hendê riwangewe, be tundî peywendîdar dekat. Egerêkî ewiha detwanê bibête hoyekî tir bo zêdebûnî tewjmî "tundirrewîslamî "le nawçe û cîhan we herweha karîgerîyekî karesatamêzîşî debê bo Kurdistan, be taybetî başûrî Kurdistan. Be baerrî min, her nebê le dêdêkî Kurdistanîyanewe, dekirê elterinetîvî 3û 4(le serewe) be yekewe girê bideyn. Bew corey ke le bas û xwasekanda hatuwe, ser le niwê dabeşkirdinewey û rêkixistewey hêzekanî emrîka le îraq û nawçe şanbeşanî

kişandinewey beşêk lem hêzane bo emrîka, dekirê dû şêwe, ya yekêk lem şêwane, wergirî: 1) kişanewey hêzekanî emrîka le îraq tenha bo derewey şarekan we cêgîr kirdinîyan le mesafeyekî/ nîzîk lew şarane; ya xud 2) kişanewey ew hêzane bo hendê wilat (cêge) î tir ke sinûrîyan hawbeşe legell îraqî erebî (îraq bebê başûrî Kurdistan). Lem şêwe dabeşkirdineweş (wate şêwey duwem) dû cêge leber çaw gîrawin, ya rasttir billêyin giftugoyan leser kirawe le basuxwasekanda, ke yekêkîyan kiweyte û ewî tirîşan başûrî Kurdistane. Be her hall, lewe deçê ke emrîka le herdû halletekeda pêwîstî bewe hebê ke çend binkeyekî serbazî le Kurdistan dabimezirênê bo ewey le layekewe hêzekanî lewê bihewênewe û le layekî tirîşewe le amadebaşîda bin bo her egerêk. Eweş debê bigutirê ke giringî manewey hêze emrîkîyekan le kiweyit û Kurdistan û tenha leweda nabê ke le îraq bekarbhênirên, bellku le dahatûy nîzîk ya dûr erk û giringî îqlîmîşîyan bibê!

Le barey binecêbûnî hêzekanî emrîka le kiweyit ya le başûrî Kurdistan, çend pirsîyarêkî giring dêne pêşewe: 1) aya emrîka le hengawêkî ewihada kiweyit ya Kurdistan ya herdûkîyan helldebijêrê? Bo welamdanewey em pirsîyare pêwîste çend şitêk tîşkî bixirîte ser.

Ber le her şitêk bo kiweyit asan nabê ke bebê dillerrawekî û bebê merc lêbigerî emrîkîyekan binkey serbazî hemîşeyî (peywendîdar be kêşey îraq û nawçe) leser xakî ew wilate dabimezirênin. Lem halletda kiweyit bîr le komellî derhawêştey nêgetîv, ke le dameziranî binkey serbazî hemîşeyî û bekarhênanî ew hêzane le îraq û nawçe dekewnewe, dekatewe. Em derhawêşte nêgetîvane dekirê le astî sîyasetî nawewey wilat û îqlîm û peywendîye erebî û xelîcî û îslamîyekan derbikewin. Nabê hergîz eweş lebîr bikirê ke her çende kiweyit dewletêkî biçûke û emrîka fezilî rizgar kirdinîşî beser ew wilatewe hebê, ewa ew wilate hernebê xawenî serwerî "neteweyî "xoyetî û be sûd wergirtin le pîrensîpî "serwerî neteweyî "detwanê we egerî eweş heye, damezirandinî binkey serbazî emrîkî, peywest be kêşey asayîşî îraq û nawçe, retbkatewe; 2) aya le rûy stratîjîyewe emrîkîyekan Kurdistan ya kiweyit helldebijêrin? Le rastîda welamî em pirsîyare asan nîye. Beher hall ewe emrîkîyekanin ke helsengandinêkî lem core deken û diwatir birrîyar leser elterinetîvekan deden. Be boçûnî min xalêkî lawazî Kurdistan lem bareyewe eweye ke em wilate daxirawe û sinûrî hawbeşî legell awî nêwneteweyî azada, ya legell wilatêk ke be bê sê û dû qebûllî kiranewe bo hatûçoy hêzekanî emrîka bikat, nîye; 3) be boçûnî xom, legell hendê xallî lawazî Kurdistanişda, egerêkî be hêz heye ke emrîka Kurdistan, wek tewawkerî rolî kiweyit we heta bigre wek take elterinetîv, hellbijêrê bo damezirandinî hendê binkey serbazî pêwîst. Dîyare lem bareyewe le mawey diwayîda hendê boçûnî giring derkewtin ke bangeşeyan bo binecêkirdinî hêzekanî emrîka le başûrî Kurdistan kirduwe. Lew danganey ke lem bareyewe dekirê xawen karîgerî bin (rîçard holbiruk) e ke ber le maweyek pêşnîyarî kird le çîwarçêwey hewllekanda bo rêgegirtin le turkîya bo ewey neyete naw başûrî Kurdistan hêzekanî (nato) le Kurdistan

binecêbikirên. Her lew çîwarçêweyeşeda binecêkirdinî hêzekanî emrîka le başûrî Kurdistan dêt. Be pêy boçûnî holbiruk hengawêkî ewiha hîç dijayetîyekî nabê legell berjewendîyekanî turkîya, bellku bigre bûnî hêzî emrîka le Kurdistan Hêminîş bew wilate debexşê. (10) be her hall, em boçûne ke turkîya nîgeran nabê le binecêkirdinî hêzekanî emrîka le Kurdistan, le baştirîn halletda corêk le xoşbînî sîyasî lexo degirê; turkîya hergîz hez nakat cêge û rêgey stratîjî Kurdistan be hêz bibê. Le layekî tirewe ewe manay wa nîye ke hengawêkî lem çeşne esllen şîyaw nîye û narrazîbûnî turîka detwanê rêge le kirdinewey binkey serbazî le başûrî Kurdistan bigrêt. Raste turkîya zor pêy xoş nabêt belam ewe diwacar emrîkaye ke le roşinayî berjewendîyekanî xoyewe birrîyarî ewe dedat ke aya binke serbazî le Kurdistan dabimezirênê yan na. Le rastîda be pêy boçûnêkî emrîkî dekirê corêk le "tekamulî stratîjî "(11) ferahem bibê le nêwan bûnî binkekanî nato le turkîya û bûnî binkey serbazî emrîkî le Kurdistan: Be pêy pîrensîpêk ke zîyatir hênirî kîsncer pêyiwe nasrawe we le sîyasetî derewey emrîka rengî dawetewe eweye ke dekirê dû wilat legell yektirda nesazên, we bigre dijayetîşîyan legell yektirda hebê, belam herdûkîşîyan dost û hawpeymanî emrîka bin. Bem manayeş eger pêdawîstî xoy ferizkird ewa bêguman emrîka detwanê binkey serbazî le Kurdistan dabinê be bê ewey hellwêstî turkîya, be zeruret, tiwanîbyêtî rêgir bêt. Be her hall, diway ezmûnî cengî îraq ke turkîya (be pêy birrîyarêkî perleman le 1î marsî 2003) rêgey neda hêzekanî emrîka be xakîda têbiperrin bo naw Kurdistan/ îraq, emrîka ewe baş dezanê ke le halletêkî hawşêwey pêwîstda egerî zore ke turkîya heman hellwîst dûpat bikatewe. Ewey ke giringe lêreda bigutirê eweye ke, le berdem egerî dananî binkey serbazîy emrîkî le Kurdistan, nabê layenî kurdî her wa be asanî be hengawêkî ewiha razî bê: Raste kurd xawen serwerî neteweyî nîye ke be asanî bitwanê billê na, belam dîsan giringe qebullkirdinîş le diway komelê hellsengandin û "hîsabat "û dananî merc bêt!

Pîrsîyar ewe aya layenî kurdî le halletêkî ewihada çî beramberêk le emrîka dawa dekat? Be bawerrî min qebullkirdinî ewey ke emrîka be hewesî xoy binke bikatewe le başûrî Kurdistan bebê ewey ke statwî sîyasî û dîplomasî ew beşey Kurdistan rûn bûbêtewe û weser xirabê helleyekî gewreye: Mebestîş le weserxistin eweye ke Kurdistan wek herêmêkî fîdiralî boy nîye rêge be (ya dawetî) hêzêkî bîyanî bika. Birrîyarêkî ewiha rêk le deselatî hikumetî îraqî (merkezî/ îthadî) daye. Bem manayeş pêwîste Kurdistan bibê be xawen serwerî (ya şêwey serwerîyek) bo ewey bitwanê, ya xud mafî ewey hebê, birrîyarêkî ewiha bidat. Debê mirov ewe bizanê ke layenî erebî, le çîwarçêwey sîsitemî fîdiralîda be pêy ew desturey ke kurd xoy qebûllî kirduwe, rêge be kurd nadat ke yeklayene bikewne naw hendê tertîbatî sîyasî û stratîjî legell emrîka. Be kurtî, le riwangeyekî Kurdistanîyewe, dameziranî hêzekanî emrîka le Kurdistan ewe pêwîst dekat ke layenî kurdî daway çend şitêk bika: 1) weserxistinî statwî sîyasî û dîplomasî Kurdistan le halletî herêmêkî fîdiralî bo halletêk ke dewêda Kurdistan bibê be xawen serwerî neteweyî, bo ewey le rêgey ew

serwerîye neteweyîyewe mafî hebê daway manewey hêzekanî emrîka bikat; 2) pirotokolêkî resmî û aşkira, we baştirîş eger em pirrotokole piştgîrî (nato) î le pişt bê (ke tîyayîda şêwey peywendî û îltizamatekan dîyarî bikirêt) mor bikirê le nêwan layenî kurdî û layenî emrîkî; 3) bo ewey Kurdistan wek "hawpeyman "nebête bargiranayî beser emrîkawe pêwîste ew wilate (başûrî Kurdistan) binemayekî abûrî behêzî xoy hebê, bem manayeş Kurdistan bebê Kerkuk natwanê le rûy abûrîyewe ew wilate be hêz bê; 4) debê bo layenî emrîkî û kurdî ewe rûn bê ke gelî Kurdistan morî emrîka (bigre leweş xerabtir morî destî dirêjî emrîka le nawçe îsraîlî duwem) î kewtote ser we dekirê eger rûdawekan be aqarêkî tirsnakda birron (weku ewey kişanewey be pelew narrêkxistûy hêzekanî emrîka le îraq û Kurdistan) be zîyanêkî zor we bigre be karesat bo kurd tewaw bibê!

Her le çîwarçêwey elterinetîvî (3 û 4 da, le serewe) nûserî em witare pêştir le zor boneda ewey dûpat kirdotewe ke beramber halletî serkewtinî emrîkay 100%le îraq ya dijekey (şkistî 100%) halletî sêhem heye ke detwanê elterinetîv bê beramber be ew dû hallete ewîş eweye ke emrîka bigate ew qenaete, ke lewedeçê kem ya zor pêştî geyîştê, ke îtir wedesthênanî serkewtinî be tewawetî (100%) le baştirîn halletda asan nîye wate razî bê be radeyek astêk le şkist/ serkewtin. Wek çon katî xoy le akanî cengî korîya (le çîwarçêwey seretakanî cengî sard) da emrîka destî be korîyay başûrewe girt we ewey qebullkird ke natwanê tewawî korîya be herdû beşekey bedest bihêne we bem pêyeş korîyay başûrîş destî be emrîkawe girt (le herdû halletda dij be tewjmî komunîzm), dekirê em ezmûne bibê be nemuzecêk ke xoy dûbare bikatewe le halletî başûrî Kurdistan û emrîkada. Hellbete pirsîyarêkî giring eweye ke aya emrîka çend amadeye em elterinetîve taqîbkatewe, her bem şêweyeş giringe bizanîn aya layenî deselatî kurdî le başûrî Kurdistan çend amadeye ke bo elterinetîvêkî lem şêweye kar bikat we aya esllen geyîştote xallî bêhîwabûn le pirrojey dewletî yekbûy îraq? (12)

### **Rapurtî biker-hamltin**

Her wek leserewe gutira, mebestî serekî em witare pêdaçûnewe û lêkolînewe leser raportekey biker-hamltin nîye bellku baskirdinîyetî le sinûrî pêwîstda bo welamdanewey ew pirsîraney ke le seretay basekeda kirawin. Be her hall, zor be giştî ew raporte wênekî narrûn we bigre tarîkîş le emroy îraq û sîyasetî emrîka we herweha başûrî Kurdistan lem peywesteda dexate rû. Nûseranî em raporte giringîyekî pêwîstîyan be boçûnî kurdî nedawe, ya rasttir billêyin giringîyekî zor kemîyan pêdawe. Be taybetî jîmareyek le pêşnîyarekanî raporteke rastexo bûnete hoy nîgeranîw dillerrawî lelay seranî kurd. Le çirrikirdinewey raporteke le yek rîsteda detwanî billêyin: Îraqî dîmokratî bedest nehat û tirsî ledestçûnî Kurdistanîş heye. (13)



raste raportî bîker-hamlîtin derbarey sîyasetî derewey emrîkaye le meseleyekî zor taybetîda, belam be boçûnî min beheman rade raporteke derbirî ew binibest û akame karesatamêzeye ke dameziranekey dewletî îraq pêgeyîştuwe.

Le têbînîyekî giştîda lew kardanewaney ke ta êsta le layenî resmî kurdîyewe derbarey raportî bîker-hamlîtin derçûn, eweman bo derdekewê ke carêkî tîrîş serkirdayetî sîyasî le başûrî Kurdistan naxwazê bas le çewtîyekanî xoy bikat we be şêweyekî rixnegirane rolî xoy hellsengênê. Ew serkirdayetîye dexwazê xoy weku qurbanî bixaterû, weku ewey ke le mawey rabirdûda ekterîkî kara nebûbê le pirosey jîyandinewey dewletî îraq. Le kardanewe resmîye kurdîyekanda, rageyandinî serokî/serokayetî herêm, Mesud Barzanî, derbarey raportekey bîker-hamlîtin ke le 7/12/2006 rageyendirawe, cêgey serince (14).

Layenî kurdî be bawerêkî zorewe le sê sal û nîwî rabirdûda şanbeşanî emrîka karîyan kirduwe bo berhemhênanewey ew îraqe dîmokratî û fîdiralîyey ke emiro be binibest geyîştuwe. We her le çîwarçêwey ew bawerey ke em pirojeye serkewtû debê, we bo ewey le piraktîkda serkewtû bê, layenî serkirdayetî sîyasî le başûrî Kurdistan karî legel mesele here hestîyar û çarenûsesazekanda kirdiwe, weku kêşey Kerkuk û pêdaçûnewey destûr û... Htd. Lem boçûnewe pêwîste hellsengandinî hendê xallî giringî raportî bîker-hamlîtin û kardanewey serkirdayetî kurd bikeyn. Be manayekî tir nakirê lew barey ke şitekanî pêgeyîştuwe ew serkirdayetîye wa be asanî xoy le derhawêşte û akamekanî karî sê sall û nîwyan bo damezirandinewey îraq biduznewe. Lêreda be şêwey çend xalêk em şêwe boçûne, wate hellsengandinî kêşekan le rêgey bînînî herdû dîwî diraw, pîyadedekem:

1-Pêşnîyarî bîker-hamltin bo "benêwneteweyîkirdin û diwaxistinî "çareserî meseley Kerkuk kardanewey nêgetîvaney lay serkirdayetî başûrî Kurdistan dirustkirduwe. Lem bareyewe kardanewe kurdîyeke, weku bilêy, xodzînewey serkirdayetî kurdîye le berpîrsî le kêşey Kerkuk. Mirov be asanî detwanê bipîrsê aya ew hemû maweyey rabirdû bo meseley Kerkuk çî kirawe ta be pêy ewey ke layenî kurdî xoy kirdûyetî raspardekanî bîker-hamltin hellsengênîn nek lerêgey derbirînî hezekanî ew serkirdayetîyewe. Lêreda pîrsîyarêkî ciddî ewey: Be leberçawgirtinî ew hemû kate zorey ke ledestdirawe we le rûy piraktîkîyewe bo Kerkuk–Kem ya zor-hîç nekirawe û katêkî kem mawe û karêkî zor mawe ke bikirê, aya rastîyekey baştir nîye serkirdayetî kurd xoy bigate ew qenaete ke belê meseley Kerkuk katî zortirî pêwîste? Aya serkirdayetî kurd razî debê be encamdanî rêfirandum derbarey çarenûsî Kerkuk bebê ewey barî Kerkuk û nawçekanî tir asayî kirabêtewe? Aya eger ew katey ke mawe beşî asayîkirdinewew çareserkirdin û rastkirdinewey zullme mêjûyîyekanî nekird ke le meseley Kerkuk û nawçekanî tir le kurd kirawin, serkirdayetî kurd her razî debê be encamdanî rêfirandum? Aya ke serkirdayetî kurd neyitwanî pêştir le zemenî kurdîda (mebest ew katey ke royîştuwe û cêge û rêgey kurd behêztir bû le emiro) kemêkîş bedest bi hênê le meseley Kerkuk, çon detwanê le zemenî erebîda (wate ew katey layenî erebî xoy behêz kirduwe) ew hemû karey mawe le pirosey be asayîkirinewe û çareserî yekcarekî be encam bigeyênî? Diwacar seyr ewe debê eger heman ew serkirdayetîye, ke emiro bîrokey dirêjikirdinewey kat bo çareserî kêşey Kerkuk retdekatewe, le sibeynêyekî nizîkda xoy daway dirêjikirdinewe ew kate bikat! Serokî herêmî Kurdistan, Mesud Barzanî, eweş retdekatewe ke kêşey Kerkuk "bixirête estoy grupî nêwedewletî piştîwanî îraq, "we cext dekatewe ke "destur mîkanîzm û mawey cêbecêkirdinî maddey 140î dîyarîkirduwe (15). Ewe le halêkda ke layenî kurdî xoy be nêwneteweyîkirdinî kêşey Kerkukî qebûlkirduwe, nek her ewe belku katî xoy hewlî zorîşîda ke ew benêwneteweyîbûne le desturda biçespê. Le madey 58, ke diwatir be tewawetî le maddey 140î destûrî hemîşeyîda çespawe, hatuwe ke "le halletî negeyîştin be çareserî kotayî kêşey Kerkuk, encumenî serokayetî boy heye dawa le netewe yekgirtuwekan bikat ke kesayetîyekî nêwdewletî lêweşawe dîyarî bikat bo tehkîm le babetî Kerkukda ". Lerastîda le katî bilawbûnewey destur, serkirdayetî kurd em be nêwneteweyîkirdine desturîyey kêşey Kerkukî be serkewtinêkî gewre bo kurd leqelemda. Be boçûnî min cîyawazî le nêwan benêwnetewîyîkirdinekey bîker-hamltin ke pêşnîyarîyan kirduwe bo kêşey Kerkuk we legel ew benêwneteweyîkirdiney ke le desturda hatuwe tenha le naw wirdekarîyekandaye û hîçî tir!

2-Rageyandinekey serokî herêm pêşnîyarekey bîker-hamltin, ke "dahatî newt bixirête jêr deselatî hikumetî nawendîyewe û Leser binemay jimarey danîştwan dabeşbikirê, "retdekatewe. Le layekî tirewe, ewey rastî bêt pêşnîyarekey bîker-hamltin şitêkî zor cîyawaz nîye lewey ke le desturî hemîşeyîda hatuwe. Le maddey 109î em

destureda hatuwe ke "newt û gaz molkî hemû gelî îraqe le gişt herêm û parêzgakan", we le maddey 110da hatuwe ke "hikumetî îtîhadî legel hikumetekanî herêmekan û parêzgakan heldestê be berêwebirdinî ew newt û gazey ke lekêlgekanî êsta derdehênirê be şêweyek ke dahatekey be yeksanî beser danîştwanî hemû wilateda dabeşbikirê ". Le xwêndinewey ew dû madeyey destur (109w110) detwanîn çend derencamêk helêncîn: 1) le meseleyekî ewiha hestîyaru stratîjîda (newt û gaz) parêzgakan û hikumetekanî herêmekan yeksankirawin we lem yeksankirdineşda, be şêwekî narastewxo, rol û giringî hikumetekanî herêmekan zor kemikirawetewe, bi) be pêy maddey 110tenha amaje be berêwebirdinî ew newt û gazey ke êsta derdehênirê kirawe we be raşkawîş basî ewe nekirawe ke newt û gazey ke le diwarojda derhênirê çon berêdebirê we aya lem halleteda dahatî newt û gaz le herêm û parêzgakan dekewête jêr destî herêm û parêzgakan xoyan ya na, 3) ewey le hemûy giringtîre eweye ke lem mesele hestîyareda hîç taybetmendîyek nedirawe be herêmi Kurdistan, ew herême nek her cîyanekirawetewe û Mamelley taybetî legel nekirawe bellku yeksanîş kirawe legel parêzgakan, bew manayeş statwî herêmi Kurdistan wek statwî her parêzgayeke!

3-Serokî herêm, le rageyandinekeyda, bîrokey pêdaçûnewey desturî be beşdarî bisporanî neteweyekgirtuwekan, retdekatewe. Keçî le layekî tirewe bîrokey pêdaçûnewe be desturda nek her bîrokeyekî taze nîye, bellku bigre layene îraqîyekan (be kurdîşewe) û emrîka û neteweyekgirtuwekan ew pêdaçûneweyan le qonaxêkî zwutirda qebûlkirdiwe we birîyarîşî leser dirawe. Heman ew serkirdayetîyey ke emiro narazîye le pêşnîyarî bîker-hamltin le mer pêdaçûnewey destur, pêştir we le hengawêkî zor nadîmokratîyaneda, eweyan qebûlkird ke diway helbjardinî perlemanî îraq (bo çîwar sal) lijneyekî destnîşankiraw le layen perlemanewe be desturda biçêtewe û gurankarî tîyada bikat, eweş meseley ûrdekarî û tefsîr û tefsîrkarîye ke aya çî Gorankarîyek we çend. Bo delêm nadîmokratîyane, çunke em qebûlkirdine diway ewe hat ke perlemanî Kurdistan reşnûsî desturî qebûlkirdbû we leweş zîyatir le rêfirandumêkî gelîda (le astî îraq û Kurdistan) reşnûseke dengî bo dirabû. Lerastîda be qebûlkirdinî em reşnûse, kurd desturêkî qebûlkird ke hîç zemanetêkî bê sê û dû be kurd nada bo katî paşekîşe û binibest, belku bigre ewey be destîş hatuwe tirsî ledestdanî heye. Cige lewe, be pêy birîyarî neteweyekgirtuwekan 1546(le 8 î huzeyiranî 2004) pisporanî neteweyekgirtuwekan (wek harîkar-yarmetîder) ew maf û rolyan pêdira ke beşdarîbiken le nûsînewey desturda, ca qise leser ewe nîye ke netewe yekgirtuwekan rolîyan heye ya na, bellku rolîyan çende û çone. Bem manayeş pêşnîyarekey bîker-hamltin derbarey "beşdarî pisporanî neteweyekgirtuwekan "şitêkî taze nîye. Lerastîda le berhêmhênanî desturî hemîşeyîda pisporanî neteweyekgirtuwekan rolî giringî xoyan bînî. Pirsîyar eweye aya dekirê bilêyin ke serkirdayetî kurd, kem ya zor, agadar nîye lewey ber le dû sal çî birîyarêkîyan dawê û çîyan qebulkirduwe û çî rûyidawe?

Diwacar xelkî Kurdistan boy heye bipirsê aya ew giftugoyaney nêwan serok komar, Celal Talebanî, le layek we grupî biker-hamltin, le katî amadekarî bo raporteke rûyandawe çî bûn we aya tallebanî tiwanîwiyetî beraşkawî boçûn û nîgeranîyekanî kurd bigeyenê? Min gumanim heye, leber hoyekî sade: Tallebanî serokî hemû îraqe! Cige leweş be pêy rageyandinekey Barzanî, grupî biker-hamltin be nameyek le layen serokî herêmwewe agadarkirawnetewe le boçûnî layenî kurdî belam grupeke "hîç giringîyekî be nameke nedawe û neşîyan xwêndotewe (16). Pirsîyar eweye aya nedekira zor ber le derçûnî raporteke xelkî Kurdistan le nameke û nîgeranîyekan agadar bikirênewe bo ewey bo carêkîş bêt kurd wepêş rûdawekan bikewê û ber leterbûn mişûrî çetir bixwat?

beherhall merc nîye deselatdaranî emrîka hemû rasparde û pêşnîyarekanî raportî biker-hamltin leberçaw bigrin, çî cay ewey ke be hemû ûrdekarîyekanîyewe wek xoy qebullîbiken. Le layekî tirewe em raporte derfetêkî tir be deselatdaranî emrîka debexşê ke pêdaçûneweyek be sîyasetekeyanda biken we leweş giringtir ew basuxwasaney ke le astî cîyacîyay resmî û naresmî le emrîka derbarey raporteke dekirên giringî taybetîyan debê bo "beneteweyîkirdinî "(17) kêşey îraq we sîyasetî emrîka lem peywesteda. Lem bareyewe raporteke, heta eger beşêkî kemîşî wek hatuwe werbigîrê, tiwanay ewey heye ke bibê be pilatformêkî hawbeş bo komarî û dîmokratikan bo gelallekirdinî stratîjêkî hawbeş.

## **Derencam**

Ew kêşaney ke legel dameziranî îraq amadeyîyan hebû, betaybetî le salaney hukmîranî beisda xistbûnewe û çirbûneweyan bexowe bînîwe. Lediway kewtinî diktator ew hemû kelekebûne mêmîyîye (betaybetî derhawêşte kulturî û sîyasîyekanî salanî hukmîranî beis) legell hindê tuxmî taze, ke beşêkîyan dirêjîbûnewey rûdawe îqlîmî û cîhanîyekanin, beşeweyekî xwênawî xoyan derdebirin.

em barûdoxe sîyasîyey ke emrîka le arasteyekî stratîjî here berzida berewrûy botewe, pêwîstî be werçerxanêk heye, berdewambûn we pêdagirtin leser ewey ke îraq wek dewletêkî yekbû bimênêtewe, be egerî zor bareke berew pişêwawî zêtir debat, le rastîda kêşeke zortir derhawêştey ew pêdagirtineye. Dîyare raportekey biker-hamltin serleniwê pêdagirtine leser pirojey dewletî îraqî yekbû, we bigre be hikumetêkî merkezî behêzewe, ew pirojeyey le serheldan û dirêjîbûneweyda ( 1920-2003), komelî tirajîdîya û komelkujî û kîmîyabarankirdinî kurdî lêkewtewe.

belam ewey ke, lelayekî tirewe, bepêy pêwîst basî nakirê û pêy leserdanagîrê ew pirsîyareye: Aya ewe çî bû way le serkirdayetî sîyasî kurd kird ke bawerî wabêt lew hemû pêkhatayey îraq detwanrê dewletêkî dîmokratî û fîdîralî pir le aşî û xoşguzeranî berhembêndirê? Dîyare lem wîtareda cext leser ewe kirawetewe ke bawerbûn be otonomîzm (wek pêkhatayekî kulturî û fikîrî û sîyasî) we dîmukrasî bo



îraq binemay heregiringî bîrubawerî serkirdayetî sîyasî buwe bewey ke îraqî dîmokratî û fîdiralî berhemhênanî şîyawê. Nek her ewe belku her em pirojeyey "îraqî dîmokratîye" "salanêkî zor qurbanîşî bo dira, we le sê sal û nîwî rabirdûda em serkirdayetîye hemû hêz û tiwanay lepênaw bercestekirdinî em pirojeyê bekarhêna.

çareserîyekî sîyasî dadperweranî kêşey kurd nakirê leser pêşîweçûn û berdewambûnêkî nadadperweraney mêjûyî bîwabîkirê, we eger her kira, ewa zû ya direng, carêkîtir be egerî zor be binibest degatewe.

raportî bîker-hamlîn be radeyekî zor piştîkirdine le "dostanî" emrîka, be taybetî kurd, we mucamelekirdinî nahezanî emrîka le nawe û derewey îraq: Le nawewey îraq mebest razîkirdinî sunney erebe we le dereweş mucamelekirdinî êran û surîyaye, emeş hemûy le pêraw be encamgeyandinî pirojey dewletî îraqe. Le layekî tirewe eger em raporte, rêk weku xoy, bixirête biwarî piraktîkewe ewa le akamda, be egerî zor, emrîka nedetwanî nahezanî xoy le xo nizîkkatewe û dostanî xoşî ledestdedat. Be manayekî tir ewey ke rastewxo peywendî be îraq û çarenûsî başûrî Kurdistanewe heye ewey ke bedesthatinî îraqî fîdiralî û dîmokratî le baştîrîn haletda asiteme û le destçûnî nîmçe azadîyekey Kurdistanîş egerêkî ciddîye.

Le layekî tirewe, lewedeçê sîyasete kurdîyekan zorbey car serpêyî bin: Ew şitey emiro xebatî bo dekirê, sibeynê boy derbikewê ke heman şit le bedesthatinîda nek her be qazancî kurd nîye belku le zererîyetî. Em boçûne rêk meseley Kerkuk û kêşey nûsînewey destur degirêtewe. Kê dellê le barudoxêkî tazedê benêwneteweyîbûnî kêşey destur û kêşekanî tir, wek Kerkuk, be zerûret be zîyanî kurd tewaw debê. Bebawerî min qeyranêkî desturî le astî nêweneteweyî lewaneye ferahembûnî derfetêk (kiranewey derwazeyek) î tirî bo kurd lêbikewêtewe.

bebawerî min kêşeke le nêweneteweyîbûn ya nebûnîda nîye, belku le şêwey têgeyîştin û hêlsukewtî serkirdayetî daye: Beher hal pêdagirtin detwanê karîgerî here giring le zor le derhawêştekanî ew rûdawane bikat ke le pêş êmen. Dîyare tirsî serkirdayetî carêkîyan le benêwneteweyîbûn we carêkî tîrîşîyan le benawxoyîbûnî (beyraqîbûnî) kêşey kurd rengdanewey ew şêwe aydyolojî û xebate sîyasîyeye ke çîwarçêwekey otonomîzme (18). Bew manayêş dîr nîye heman ew benêwneteweyîkirdiney kêşekan, ke emiro le kardanewey serkirdayetîda retdekrêtewe, sibeynê bibête dawakarîyekî kurd le beramber hêriş û retkirdinewey layenî erebî we zêdebûnî tirs le xokêşanewey emrîka le îraq!

## **Hendê bîruboçûn û "pêşnîyar"**

Lem beşey wîtarda hewlîdedem çend bîruboçûnêk bixeme pêş çaw, belku wek berçawrûnîyek û beşdarîyek le giftugokanda werbigîrên. Mebestîş lêreda ewey ke qonaxeke dîr le hendê diruşm û muzayede û birîyarî bepele pêwîstî be xwêndinewe

û lêwirdbûnewe heye. Demewê eweş bilêm ke em bîru boçûnane çend rûyan le deselatdaranî Kurdistane, hernebê ewendeş rûy le ray giştî Kurdistanîye:

Pêwîste serkirdayetî sîyasî le başûrî Kurdistan, herçî zuwe, hewlî rêxistinî grupêk le pispor û şarezayan bidat. Karî ew grupe ewebê ke, beşêweyekî babetîyane û le astêkî pêwîstîda û le dîdêkî Kurdistanîyewe, pêdaçûneweyek be ew sê sal û nîwey rabirduwewe bikat, em grupe pêwîste le pisporanî şareza û tewaw serbexo pêkibêt we behîç şêweyek karîgerî hîzbî ya herşêwe karîgerîyekî tîrî, le dûr û nizîkewe, leser nebêt. Berhemî karî em girope nek her lêkolînewe bêt, belku bitwanê le hemû mesele peywendîdarekanda pêşniyarî pêwîst bikat.

Bebawerî min lem qunaxeda rageyandinêkî çend xalî lelayan serokayetî herêmewe bes nabêt bo welamêkî pir bepêstî eger û nîgeranîw pîrse henûkeyîyekanî başûrî Kurdistan. Em qonaxe pêwîstî be zêtir heye le astî yekxistinî sîyasetekan we têkelawkirdinî cemawer û ray giştî Kurdistan beşêweyekî pozetîv û pêwîst. Em qunaxe çend rexne le heloystî bîker-hamlîn helldegirê, ewendeş bexodaçûnewe û hewsengandinî sîyasete kurdîyekan û rixnelêgirtinîyan pêwîst dekat.

Em qunaxe pêwîstî be nimûne, ewe heye ke serokî herêm "witarêk bo netewe "pêşkeş bikat ke tîyayda be şêweyekî kirawew şefafîyetewe destnîşanî kemukûrîyekan le sîyasete kurdîyekanîda bikirê we şêwe boçûnî serkirdayetî sîyasî bo meselekan rûnibikirêtewe. Emiro serkirde û cemawerî Kurdistan radideyekî nîgeranîyan pêwîste, nek şardinewew bêdengkirdinî nîgeranîyekan, bo hênanegorêy hendê pîrsî ciddî û geran bedawî welame şayistekanda. Berdewambûn leser gutarî îraqî fîdîralî û dîmukrasî û niwê detwanê haletî ewey min pêyidelêm bencbûnî xelkî Kurdistan dirêjtir bikatewe, be hendê asewarî karesatamêzewe.

Çalakkirdinewey bepeley dîplomasî (dîplomusîyetî) kurdî le Ewropa û cîhan bo qeyandinî nîgeranîw kêşekan weku hen. Debê serkirdayetî hernebê lem qonaxe hestîyarewe ew heleye, wate ragirtin (ticmîdkirdin) î hemû çalakîye dîplomasîyekanî başûrî Kurdistan bû le rojaway ewropa, rastbikatewe ke sê sal û nîwe leserî berdewame.

Le mawey diway kewtinî diktatorewe layenî kurdî, rasttir billêyin serkirdayetîyekey, le qeyranî sîyasî û dîplomasî tirsawe û xoy lê bedûr girtuwe. Cige lemeş heleyekî gewrey kirduwe ke hemû bawer û wizey xoy xistute ser ewey ke be giftugo dekirê kurd ew şitaney daway dekat bedestî bihênê. Eger çî serkirdayetî sîyasî le başûrî Kurdistan ta êsta hewlîyandawe ke hîç qeyranêkî sîyasî ya dîplomasî le pirosey damezirandinewey dewletî îraq rûnedat, ewkataney nîmçe qeyranêkîş rûyidabêt, ewa herzû be giftugo "çareserkirawe ", ya rasttir billêyin be giftugo hokarekanî qeyran carêkî tir dapoşirawnetewe. Min bawerim waye le nîmçe qeyranekey herdewayî, derbarey alay îraq (bilê alay beis), serkirdayetî kurd neyitwanî Mameley pêwîst legel qeyranda bikat we diwacar taradeyekîş be zîyanî layenî kurdî tewawbû. Bebawerî min xodzîneweyek le qeyran heleye, bigre hendê carîş qeyran pêwîstîyekî sîyasî û

dîplomasîşe bo ewey serlenwî bepêy mercî xot hawkêşekan bixemlênîtewe. Ew amrazey ke detwanê biriyarderbêt lem bareyewe pêdagirtin û wegerxistinî rast û dirustî îradey xelkî Kurdistanê; wegerxistin nek bo muzayede ya bo hendê mebest ke lerastîda pêwîstî be biziwandinî cemawer nîye: Bebwandinî cemawer wereqeyekî stratîjî bêt û bes.

Herçende ew serkirdayetîye wîstûyetî wa pîşan bidat ke ew be peroşe bo beşdarî xelkî Kurdistan le pîrse neteweyîye çarenûssazekanda, belam ta radeyekî zor detwanim bilêm pêçewanekey rast buwe. Lerastîda bigre tirsêkîş hebuwe le besîyasîbûnî şeqamî kurdî: Lebirî ke em şeqame weku seçaawayekî hêz bibînirê, wek xeterêk bo ser deselatî em serkirdeye bînirawe. Eger wanîye boçî em serkirdayetîye, betaybetî herdû hizbî serekî, rêgeyan be xelkî Kurdistan neda be sedan hezar birijêne ser şeqam lerojî 22î şîwatî 2004, ew rojey be hezaran le xelkî Kurdistan le taruge le jimareyekî zor le paytext û şarekanî cîhanî rojawa hatine ser şeqam bo dawakirdinî çareserî kêşey kurd le rêgey rîfirandumewe. Her le peywestî rîfirandumda, bo hendê kesayetî erebî hebûn, eger çî kemîş bûn, beraşkawî layengirî daxwazîye giştîyekanî bizavî rêfirandum bûn, belam em serkirdayetîye ta boy kira xoy dizîyewe le heloysteyekî sîyasî û şefaf û şayiste lem bizavî rêfirandume? Ewey lêreda debête pêşnîyar eweye ke kemtirîn şit lem qonaxe bikirê eweye ke hemû bendawêk labbirê le berdem xelkî Kurdistan. Wextêk sîstanî tiwanî be xopîşandanî 100.000kes le bexda zor le mercekanî sîyaset bigorê, bo layenî kurdî be rêgekirdinewe leberamber sedan hezar kes natwanê be hîzî taze û mercî tazewe karîgerî bixate ser meydanî sîyasî? Eweş giringe bilêyin eger xelkî Kurdistan be muzayede û hendê gemey sîyasî hîzbîyane hêniraye ser şeqam ewa ew wexte hengawî ewiha nek her natwanin yarmetî çareserî kêşekan biden belko karêkî lem core bigre qeware û qulayî karesateke zîyatir û firawantir deka!

Hergîz bebê misogerbûnî serwerî neteweyî bo başûrî Kurdistan nabêt her wa be asanî biwar bidirêt ke emrîka le başûrî Kurdistan binkey serbazî dabînê. Emrîkaş pêwîste ewe bizanê ke le çîwarçêwey ew tertîbate desturî sîyasîyey îraq layenî kurdî boy nîye peymanî stratîjî morbkat û daway hêzî bîyanî bikat: Katî ewe hatuwe û zorîş direnge, eger hawpeymanîyek heye lenêwan kurd û emrîka, ewa pêwîste ew hawpeymanîye pênasibikirê û nawerokî bidirêtê û çîwarçêwey bo darêjirê. Kemtir leme manay waye kurd bacî şitêk dedat ke lerastîda eslen be destî nekewtuwe.

Ewey ke ta êsta weku kêmasîyekî ciddî le sîyasete kurdîyekan le başûrî Kurdistan têbînîmkirdiwe eweye ke layenî kurdî pîlan û pirojey sîyasî elterinetîvî nîye bo halletî binibest û paşekîşey ciddî le pirose sîyasîyekanda. Bem manayeş her êsta (lerûy sîyasî û nefisî û abûrî û dîplomasîyewe) kurd amadenîye (rasttîre bilêyin amadenekirawe) bo roberûbûnewey halefî yekcarekî binibest û paşekîşê. Eme girfit û kêmasîyekî çarenûssazew her rojêkîş diwakewtin le çareserkirdinî dekirê qeware û mewday karesatî dahatû qultir û mezintir bikat. Lem bareyewe dekirê tawtwêkirdinî

elterinetîvî 3w 4le serewe (zîyatir nasraw be nemuzecî kurîyayî başûr) û pêwîstî emrîka be serleniwê rêkxistinewey hêzekanî hendê berçawrûnî bidat le baskirdinî elterinetîv.

Her le barey elterinetîvekan, pêwîste ewe bizanirî ke kêşey here gewre le îraqî pêş û diway sedam kêşey deselat buwe, we emiro be şêweyekî xoênawe berdewame. Erebî sunne le mawey 83sallda (1920-2003), kem ya zor, tewawî deselatî sîyasîyan bedestewe bû we ewro kêşey ew kemayetîye ewe nîye ke beşî xoy (nizîkey 20% le deselatî sîyasî) pêrewa nebînirawe, belku eweye ke êstaş sunney ereb çawî le 100%y deselate. Nek her ewe belku layenî sunne xoy be xawenî rasteqîney îraq dezanê û her bo ewîş rewaye ke pênasay dewletî îraq bikaw destnîşanî bejewendîye nîştîmanîyekanî bikaw qulayî stratîjî em wilateş dîyarîbkat. Lew guşbînînewe hemû ew hewlaney ke ta êsta dirawin bo firahemkirdinî hawkêşeyekî sîyasî ke hemû layek pêy razîbin be tewawetî serkewtû nebûne nek her ewe belku ewro îraq le hemû rojêk le heldêrî yekcarey şerî nawxoyî nizîktire. Ewro cîyakirdinewey sê parçey îraq leyektir nek her be tundî hatute pêşewe, belku xerîke wek take elterinetîvêkîş demênêtewe bedest îraqîyekan û cîhan: Tenha ew elterinetîveye ke be şêweyekî rasteqîne û yeksan meseley deselat yeklayîdekatewe. Le çareserêkî ewihada her yek le erebî sunne û şîye û xelkî Kurdistan 100%y deselat beser xak û saman û serwerî xûyanda bedestdehênin. Le baskirdinî em şêwe boçûne nabê emrîka û cîhan diwabkewin, be her hal eger ewanîş diwabkewin nabê kurd lewe diwabkewê. Pêwîst nakat îraqîş be ezmûnî yugslavîya le komelkujî û tirajîdîya mirovîyekan têperbbêt bo ewey ew kate, ke direnge, cîhan û emrîka û kurd wişîyarbbnewe.

Emiro le hemû katêk zêtir pêdawîstî le yektir geyîştinêkî kurdî/turkî/ emrîkî xoy sepanawe. Ew leyektir geyîştîneş nabê tenha weku hengawêkî serpeyî temaşa bikirê belku debê zorîş stratîjî bê, raste ferahemkirdinî leyektir geyîştin û lêkinzîkbûneweyekî ewiha hernebê ta ew cêgeyey peywendî be dîyalogî Kurdistanî/turkîyewe hebê karêkî asan nîye, belam pêşuweçûnêkî ewiha zerûretêkî stratîjîye bo kurd. Herçende lem bareyewe hendê pêşuweçûn hen belam rehendî turkîyayî le kêşekanî emiro û diwarojî Kurdistan ewende giringin ke ewe dehênê layenî kurdî kat û wizey sîyasî û dîplomasî zortirî bo terxan bikat. Lem bareyewe erkêkîş dekewête ser şanî bizavî rizgarîxwazî bakûrî Kurdistan.

\*lem wîtareda wişey dîmokirasî wek naw, we dîmokratî wek awelnaw bekarhatûn.

\*\* xwarkirdinewey û hêlbejêrdahênan le wîtareda be manay cixtkirdinewey hatûn.

## Perawêzekan

1)Biriwane di. Burhan yasîn, "le rîfirandumda Kurdistanêkî serbexo ", govarî gizing, jimare 38. Herweha biriwane fesilî yekem le kitêbî:

Majid kihadduri, tihe Gulif War. The originis and implicationis of tihe Iraq-Iran Conflict, (New york & Oxford Universitî piresis, 1988)

- 2) biriwane: [Httip: //topics. Nïtimes.Com/top/refirence/timestopics/people/r/donald\\_h\\_rumsfeld/index.html? Inline=nitper](http://topics.Nitimes.Com/top/refirence/timestopics/people/r/donald_h_rumsfeld/index.html?Inline=nitper)>Donald
- 3)Deqî namekan bo maweyekî zor le ser malperî kurdîş mîdîya berçawdekewtin diwatirîş le govarî metîn, jimare 145, ugustî 2006, weku dû belgenome bilawbûnutewe.
- 4)Bo boçûnêkî lem şêweye biriwane "fugoyek legel di. Burhan yasîn: Çend têzîg derbarey kurdu pirosey sîyasî le îraqda "le Kurdistanî niwê, 23/8/2005 , li. 9.
- 5)Giftugo legel di. Burhan yasîn, sazdanî tiwana Ehmed û cemel Husên, Kurdistanî niwê, 16/12/2003, li. 7, çapêkewtin legel di. Burhan yasîn, sazdanî Mecîd Salih: "pirojey rojhelatî nawerastî mezan ". Beşî 1, Kurdistanî nwî, 1919/5/2004 , li. 8.
- 6)Biriwane raportî biker-hamltin:  
III & Lee H. Hamilton, (Co-Chairs) tihe Iraq studî Grup Report, (New York: Vintag Bookis, James A. Baker 2006), p. Ix.
- 7)Bo basêkî giring lem bareyewe biriwane kitêbekey pol birêmer:  
Paul Bremer III, Witih Malcolim McConnell, My year in iraq: Tihe stiruggle to build a future of hope, New York: Simon & Schuster, cop. 2006 .
- 8)Le raportî (biker hamltin) da komelî pêşniyar (be taybetî raspardekanî 1ta 19) derbarey be sîyasîkirdin û dîplomasîkirdinî kêşeyî îraq le rûy îqlimî û cihanîyewe, kirawin be taybetî dîyalog legel êran û surîya.
- 9)Beyraqîkirdin be manay amadekirdinî îraqîyekane, be taybetî hêzî serbazî û polisî û asayîş, bo ewey bitwanin leser pêy xoyan rawestan û karubarî xoyan berêweberin, herweha yarmetîdanîyane bo behêzkirdinî damezrawekanî dewlet, wek wezarete giringekan be taybetî bergirî û nawxo, leser binçîneyekî modêrn.
- 10)Rîçard hulbiruk şalîyarî pêşûy emrîka bû le netewe yegirtuwekan; derbarey boçûnekanî biriwane:  
Paul Taylor, "Former U. S. Aides suggest NATO tiroopis in N. [Northerin] Iraq "Rewters, Tuesday, 21 Nov. 2006
- 11)Mebest le "tekamulî stratîjî "eweye ke dû tuxim, dû nawçe ya dû wilat le rûy giringî stratîjîyewe yektir tewaw biken we le wedesthatinî hawahengî û guncan le nêwan ew dû tuxmeye nawçeye ya wilate û tekamule bidestdêt. Leber ewe xirawete naw amajey wergirtin (îqtbas) çunke bo yekem care bekarî dehênim we piştirast nîm ke ber le min kasêkî bakarêhênabê.
- 12)Bo boçûnêkî lem şêweyey nûser le zor cêga be nûsîn û giftugo bilawbûnetewe. Bo nimûne, biriwane govarî metîn, hijmara 145, ugustî 2006, we herweha "çawpêkewtinêkî bilawnekirawey di. Burhan yasîn le gel govarî livînda:  
Jmare 235, 9dec. 2006. Ûw. Dengekan. Com
- 13)Lewaneye le baştirîn haletda wextêkî kem mabê bo ewey be piştirastî ew derancame bem şêweye derbirîn. Be her hal, nûserî em wîtare lew dû nameyey ke le parawêzî 3serewe amajeyan pêkirawe be raşkawî serkirdayetî herdû hêzî serekî (partî û îkyêtî) agadarkirdotewe le tirsî ewey ke eger îraq le ser heman pirojey birîtanî bî nabikîrêtewe ewa metirsî ciddî heye ne îraqî dîmokratî bedest bêt we Kurdistanîş ledest biçêt we bem maneş le namey dühemda (be Berwarî 11/4/2003) ewiha denûsê: "eger kurd rabikêşirête naw gemeyekî ewiha xeterî heye Kurdistanîş ledestbda we îraqîş bedestînehêne".
- 14)Bo deqî rageyandineke biriwane, bo nimûne, dengî serbexo:  
8-12-2006 ûw. Kurdistanan. Net
- 15) serçawey pêşû.
- 16) serçawey pêşû
- 17) mebest le beneteweyîkirdin eweye ke kêşey îraq û sîyasetî emrîka lew barewe weku kêşew sîyasetî take hîzbêk Mameley le tekda nekîrê bellku weku kêşey hemû emrîkîyekan we dewletî emrîka bibîrê.
- 18)le naw kirokî gutar û dîplomasî otonomîzmda em dijayetîye, ke zor carîş çarenûssaze, amadey hebuwe û heye yekê lew dijayetîyaney ke betundî û zeqî le nêwan benêwneteweyîbûn û be îraqîkirdinî kêşey kurd le başûrî Kurdistan xoy niwand le salî 1991da bû: Le layekewe be tundî be nêwne